Folkpartiet

# YE (Yekîtiya Ewropa)pêwiste!

Welatên Ewropa-tevlî yên herî mezin jî-tev biçukin ji bo ku li ber wan hemberiyên nuha peyde bune bi tenê rawestin.Yek ji wan pirbûna tawanbariya nawnetewiye.yek jî gorînên baûhewayê ne. Yeke din jî, xwe xurtkirina li hember îflaskirinê di dema Cîhanîbûnê de ye.Û yeke din jî,jêxwestinên herî mezintirîn ewin ku li hember tirsa derketina şer,serdestî,feqîrî û tirsa ji terorê ku li derveyê herêma yekîtiyê, rawestîn û pêşî lê girtine.

YE pêwîste.Pêwistiya Swêdê jî bi YE heye.Di demeke ku swêdiyan ji valutayek tebeyî re gotine na û xurtiya li dijbûna YE ku bi hêze jî, divê ev tişt vekirî û bi dengê bilind were gotin: Em ê ji YE ku di gelek xalande bi awayekî serdest bi hêz faîde bigrin.

Ji ber ku em bi zelalî dibînin ku pêwîstî bi YE yek bihêz heye,li wir dive bihêz be,em rexnegirin di hinek babetande li ser YE î ya îro.Alîkariya ji bo çandiniyê ya ku piraniya îmkanan dixwo û ne ji bo faîdeya welatên feqîr e,hewildanên ku ji bo pêşketin ji bo ”corbicor bazirganî” çênebe, bîrokratî, daxwaza ku xwe tevlî kirina hinek tiştên ku welatên endam bixwe ji heq dertên.Tiştên wihane yên ku em divin bigorin.Di rojeva me de heye û bi hev re tevî wan xalan ku em divin yekîtiyê bihêztir bikin.Yek tişt misogere:Swêd ne di navdebe,yan jî hinek nûnera rêke wir da ku bi xwazin zixuran bavêje nava vê çerxê,hingî em ê nikarbin pirr tiştan bikin.

***Ji bo şerê tawanbariya navnetewî were kirin divê YE bihêztir bibe.**
Divê YE şerê tawanbariya diser sînoran re bike wek ya bazarganiya liser mirovan, qaçaxiya narkotika,spîkirina pera û terorîzmê.Em divin FBI yek Ewropî peydebikin ji bo bihêz şerê mafyayên organîzekirî bike.Em divin bihêz îmkanan pirr bikin ji bo rinddir şerê tawanbariya li Ewropa bê kirin.

***Ji bo şerê peydebûna pirsgirêkên derdoran û gorînên di baûhewayê de çêdibin ,divê YE bihêztir bibe.**
Divê Ye karibe biserdestî siyeseta derdoran birêve bibe.Berdana kol dioksîd wê kêm bibe,bijahrkirina avê,erd û hewayê bihêz werê rawestan. Hingî pêkanîna konferensên navnetewî têr nake,lê pêwistî bi qaîdeyên tebayî ku aliyan girêdide heye.Em divin ku YE bikaribe bi piraniya dengan qaîdeyên weha tesbît bike.

***Ji bo li Cîhanê bêhtir aşîtî,dadmendî û demokrasî çêbe, divê YE bihêztir bibe.**
YE divê karbike ji bo aşîtiyê û Cîhanek bitaybet demokratik,mafë mirovan û pêş ketina xêrûxweşiyê.Bazirganiya azad keresteyeke mûhîme ji bo mirov bighe wir.YE dikare bi roleke girîng rabe ji bo karûbarê bilind kirina hevkariyek Cîhanî.Siyaseta derve divê bêtir û hevbeş were organîze kirin û divê îmkanên yekîtiyê bêne pirr kirin ji bo aşîtiyê, demokrasî û pêşketinê.

***Ji bo beşkirina desthilatdariyê di navbera yekîtiyê û welatên endam de zelal be,qanûnek bingehî û nu dive.**
Divê yekîtî bêhtir xwedî desthilatdarî be, Ji bo şerê tawanbariyê,siyaseta derve û derdoran, le li piraniya deverên din divê welatên endam mafê xwe yê biryarê biparêze yan jî zêdetir xwedî maf be.2

***Mafê biryarê di babetê xêrûxweşiyê de divê li welatan vegere.**
Mafê welatan yê biryarê li ser pirsên civakî divê ferehtir bibe.Wek nimûne ”qaîdeya deh seetan” ya ku mafekî dide gelek kesan ku alikariyê wergire, divê rabe û pirensîbê ku Swêd divê alikariya pereyî ya zarokan bide zarokên ku ne li Swêdê dirunin ne pêdivî be.Û divê ji bo cihê gorin û awayên vexwarinan û toreyên welatan ferehtir hebe di siyaseta alkoholê de.

***Siyaseta YE ya çandiniyê tune bike.**
Ajotina bi zêdeyî produksiyon di rastiyê de pêşgiriyê peyde dike ji bo produksiyona tiştên xwarinê li welatên lipaşmayî .Ew rê dide ku çandiniya Ewropa bipêş nekeve li gor şertên bazarê û serfkaran,lê di hikûmetan de asê dimîne, ew ê ku bi xurtî produksiyonekê dajon wek yek ji wan jî bi zêdeyî xwedîkirina heywanan ne.û ji ber ku gelekî bihaye jî endametiya YE bi awayekî naye qabûl kirin bilind dike.Parek ji alîkariyên îro divê ji bo bipêşketin û parastina herêmên kêmavayî û derdoran were veqetandin,bi gotineke din alîkarî ji bo ”herêmên vekirî”.

***Piyaseya hundur pêkbine.**Heger Ewropa hemî bibe ”piyaseya malê” ,manaya wê ji bo şirketên Swêdî gelek kar û zêdebune.Karûbarê YE ji bo pirsên zêdebûnê (prosesa-lizbonê) divê şidandî be,berî her tiştî bi metoda ”nimuneya desthilat” .

***Bihêle ewro bikar were.**Her çiqas Swêdê li derî hevkariya ewro be jî,ji menfeetên me ye ku hevkariya walûtayê rind bikar were.Divê pişgirî lê were kirin bi awayê peymaneke domdar ya ku herkes rêz lê bigre.Di rêbazê de lêhur meyze kirin dibe ku pêwîst be.

***Siyasetek mirovane ji bo penaberan.**Mirovên ku îro pêwistiya wan bi parastinê heye nayênqebul kirin. Her çiqas mirovên ji bo mayîna li Ewropa daxwaz dikin nikarin bimînin jî ,nayê wê manayê ku mecala ceribandina huquqî ji bo mafê penaberiyê nabe ku bête xerab kirin. Berpirsariya transportê ku tê gotin-ya ku personalên frokê li ber dezgehekî tê mecbur kirin ku biryarê li ser penaberekî bide ka gelo ew dikare sebebên penaberiya xwe biceribêne heye-divê ji holê rabe.

***Parastina Ewropa divê ji aliyê Nato ve were kirin.**Her çiqas YE di siyaseta derve û ewlekariyê de divê daxwaza hevkariyek bibahwerî bi Emrîka re hebe û bi demokrsiyên din yê Cîhanê re jî bike.Weku destek ji bo NATO divê YE ligor şarezayiya xwe ji bo alîkariya Krîzên(buyerên xerab) ku li Cîhanê peyde dibin,digel îmkanên leşkerî jî be xwe ava bike.

***Divê YE ferehtir bibe.**û ya herî baş ku welatên Ewropa yên ku demokrasî ne û rêzgirtina wan ji mafê mirova û fikra azad re heye, hemî tevlî bibin.Gelekî li dur jî divê Rusya bikaribe bibe endamê YE.

***YE divê bi bazirganiya serbest rabe**.Şerme ku YE bi hevkariya Emrîka û bi alîkariyên xwe yên pirr zêde ji bo çandiniyê, pêşiya bi xurtî bipêş ketina bazirganiya serbest ya navnetewî dikin.Ew kirinên ha bi xurtî zerarê dide welatên lipaşmayî .Jiwir tirsa derketina şer û ji hevdûrketinê li Cîhanê zêdetir dibe.

***Endametiyê daxe** bi awayê ku piraniya alîkariya ji bo çandiniyê û siyaseta herêmî ji holê rabe û di wî wextî de arzaniyên ji bo Britaniya mezin jî bicarekê rabe.